Teknikprogrammet

KURMANJI

2016-09-28

Bernameya teknîkê

Utbildningsinfo

Skolverket

Barnameya teknîkê bernameyeka amedekirinê ji bo xwendina bilind e û bidestxistina dîplomeya amadebûna ji bo xwendina bilind armanca wê ye.

Bernameya teknîkê ji te re ye yê ku hez dike di warê teknîk û prosesên teknîkî de kar bike. Ev xwendin ji bo domkirina xwendina teknîk û siruştnasiyê/xwezanasiyê di perwerdeya bilind de bingeh e. Tu dê şertên xwendina bilind ji bo warên zêdetir jî bi dest bixî.

PÊNC PISPORIYÊN CUDA

Nexşsazî û pêşxistina berheman

- Tu dê zanyariyan li ser nexşsazî û pêşxistina berheman werbigirî. Giringî dê li ser nexşsazî û avakirina bi rêya komputerê be.

Teknîka înformasiyon û wesîleyan

- Tu dê zanyariyan li ser teknîka ji bo înformasiyon, komunîkasiyon û wesîleyên cuda wek komunîkasiyona bi rêya komputeran, bernamekirin, wesîleyên dîjîtal û pêşxistina înternetê werbigirî.

Teknîka berhemsaziyê

- Tu dê zanyariyan li ser berhemsazî û şîrketkariyê wek otomatîkkirin û kontrolkirina xetên berhemsaziyê werbigirî.

Civakavakirin û jîngeh

- Tu dê zanyariyan li ser civakavakirin, jîngeh û avahîsaziyê, ku tê de teknîk bi qasî ekolojî, dirûv û aboriyê giring e, werbigirî.

Teknîknasî

- Tu dê zanyariyan li ser metodên karî yên teknîknasiyê û alavên ji bo modelsaziya matematîk, şibihkarî, kontrolkirin û eyarkirinê werbigirî.

Tiştên ku tu di vê bernameyê de fêr dibî

Tu dê zanîna xwe di warê teknîk, fîzîk, kîmya û matematîkê, ku giringî li ser prosesên teknîkî be, de pêşde bibî. Tu dê fêr bibî ku gava teknîk pêş dikeve tu hevbendiyên di navbera beşên cuda de bibînî û tê bigehî ka çawa pêşketina teknîkê di civakê de rû dide. Tu dê teknîka heyî û pêşketina teknîka nû bixwînî.

Bername weha hatiye rêxistin

Madeyên dersê di bernameya teknîkê de madeyên lîseyê yên hevbeş in: îngilîzî, dîrok, werziş û tenduristî, matematîk, zanist, zanyariyên dînî, zanyariyên civakê û zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê. Di bernamyên amadekirina ji bo xwendina bilind de, tu kursên teorîk yên zêdetir ji yên bernameyên pîşeyî dixwînî.

Madeyên taybetmend yên hevbeş yên bernameyan ev in: fîzîk, kîmya û teknîk.

Îmkan heye ku tu di bernameyê de xwe pisportir û zanatir bikî. Ji wê re bernamekûrkolîn (programfördjupning). Ev dikare madeyên wek avahîsazî, wêne, biyolojî, zanîna elektrîkê, teknîka ahengan, felsefe, fîzîk, cografiya, dîrok, civaka ava, teknîka tibê, teknîka şebekeyan, perwerdekarî, bernamesazî, psîkolojî, swêdî û teknîka înternetê. Ji xwendingehê bipirse ka ew kîjan kursên kûrlêkolînê dide.

Hilbijartina ferdî jî heye ku tu dikarî wê ya ku tu dixwazî bixwînî hilbijêrî. Ji xwendingehê bipirse ka kîjan kurs hene.

Awayên xebatê

Di vê bernameyê de, tu dê bi rexnekirina çavkaniyan li înformasiyonan bigerî û li ser bixebitî. Tu dê hin pirsaên pratîk yên ku tu dê bi serê xwe yan bi hevkarî li gel kesên din, piraniya caran wek projeyekê, bersiv bidî bikî bingeh. Tu dê şiyana xwe ya pêşxistina çareyên nû û behremend pêşde bibî û bêtir fêrî îmkanan bibî ku şîrketeka şexsî bi rê ve bibî.

Tu dê ji bo ku baştir sîstemên teknîkî fehm bikî fêr bibî ku analîzê bikî, modelan saz bikî, şibihsaziyê bikî, minasibiyê hilsengînî, pêşxistinê pêk bînî, hevbendiyê bibînî, encaman derxînî û delîlan pêşkêş bikî.

Projeya lîseyê

Tu dê di dawiya Bernameya teknîkê de projeyeka lîseyê amade bikî. Tu dê pirsekê hazir bikî û karekê mezin yê ku li ser warên zanyarî yên giring yên bernameyê ava dibe plan bikî, pêk bînî û hilsengînî.

Balkişandin

Giring e ku tu xwendina xwe plan bikî heger tu bixwazî şertên taybetî yên xwendineka bilind bi dest bixî. Heger tu bixwazî hêjî bixwînî, li gel rêberekê xwendin û pîşeyê biaxive.

Hergav mafê te heye ku tu di çarçoveya hilbijartina ferdî de kurseka din ya zêde di warê werziş û tenduristiyê de û kurseka hunerê hilbijêrî.